Kurteçîrok

Perde

Îsa Tahir

Winda bû... Tîrojkên ronahiyê, xwe di tariyê werdikirin û birînên ron li laşê şevê çêdikirin. Şevê jî, hêdî hêdî, dest dadihêlan û xwe dida destê çarenivîsê xwe yê dawiyê.
Çireq.
- Bîsta qeyd bike.
- Pa te zaniye?
- Çiye?
- Berî satekê, êkê gote min, ne windabûye û ne çu! Li mala xwe ye, xwe heşardayî.

Diyar bû... Tîrşevên tariyê, xwe di ronahiyê werdikirin û birînên tarî li laşê rojê çêdikirin, rojê jî, hêdî hêdî, dest dadihêlan û xwe dida destê çarenivîsê xwe yê dawiyê.
Çireq.
- Bîsta qeyd bike.
- Pa te zaniye?
- Çiye?
- Berî satekê, êkê gote min, ne diyar bûye û ne çu! Windaye û kes nizane li kûve ye.